Royal College of Anaesthetists

# Bûjenên benckir – metirsî û bandorên digel

# **Azardîtina ziman, lêv û diranan**

## Derbarê vê belavokê

Ev belavok di derbarê azar**dîtina ziman, lêv û diranan** e ku dibe piştî benckirina giştî rûbide. Ev belavok, sedemên vê azardîtinê û tiştên di derbarê wê de ku dibe rûbide rave dike.

Benckirinên giştî ew derman in ku mirov dixe rewşekê ku dişibe xeweke giran. Ew ji bo hin neştergerîyan û prosedûran girîng in. Dema benckira gelemperî li dar e, mirov bêhiş e û tiştekî hîs nake.

Hûn dikarin li ser malpera me derbarê cureyên bûjenên benckirnan bixwînin, ku bi zimanên cuda li vir berdest in: www.rcoa.ac.uk/patientinfo/translations#languages.

## Di heyama benckirinê de, azardîtina ziman, lêv û diranan

Carinan piştî benckirinê dibe ku ziman û lêven we biqelişin an jî şînbibin. Ev bi piranî di nav çend rojan de birîn dibin.

Di dema benckirina giştî de dibe ku diranên we biderizin, sistbibin an jî bi bêhemdî bikevin.

Di dema benckirina giştî de, masûlkeyên laşê we rehet dibin, tevî yên li dora qirik û sînga we. Ev dikare rêjeya hewaya ku diçe pişika we kêm bike.

Ji bo berdewamiya derbasbûna oksîjenê ber bi pişika we ve misoger bike, benckirzan dibe ku lûleyeke bêhngirtinê di gewriya we de bi cîh bike da ku rêhewaya we vekirî bimîne. Ew yek bi piranî piştî ku hûn bêhiş dibin bi cîh tînin.


Lûle yan jî rûpoşên ku benckirzan li dema bêhişbûna we bi kar tîne, dibe ku bi bêhemdî zirarê bidin diran, lêv û zimanê we. Ev amûr, ji bo ewlehiya we ya di dema benckirê de girîng in.

Agahiyên zêdetir di derheqê rêhewa û bêhnkişandina we ya di dema benckirinê de, bi zimanên cuda li ser malpera me berdest in:
www.rcoa.ac.uk/patientinfo/translations#languages.

## Çiqas pêkan e ku ev yek biqewime?

### Li ser ziman û lêvan qelşên bişûk û şînbûn

**Ji her 100 kesî**



**1–5** dît

**95–99** nedît

### azardîtina diranan ku mudexaleya diransazî hewce dikir

**Ji her 10.000 kesan**

**5 dît** | **9995 nedît**

Diran û pidîyên ji nêvî zêdetir kesên ku zerar li diranên wan hatibû, berî niştergeriyê di rewşeke nebaş de bûn.

Ev hejmar ji xebatên lêkolînan hatine wergirtin. Hûn dikarin li ser malpera me bibînin bê me ev hejmar ji ku wergirtine: www.rcoa.ac.uk/patientinfo/risks/evidence.

## egera tiştên azardîtinê zêde dikin hene?

egera azardîtinê di van rewşan de zêdetir dibe:

- heke ku hûn nikaribin devê xwe pir zêde vekin an jî stuyê xwe bi rehetî bilebitînin. Bo nimûne, hin rewşên movikkulîyê, di dema benckirina gştî de, dikarin bibin asteng ku hûn stuyê xwe yan jî serê xwe bilebitînin
- di rewşên diranfîqî û jêreçena biçûk de
- heke di demeke awarte de hewcedarî bi benckirina giştî çêbibe
- heke hewcedarî bi benckirina giştî ji bo niştergeriyek awarte ya sezeryanê çêbibe
- heke qelewî bi we re hebe yan jî dora stuyê we zêde qelew be
- heke dê niştergerî li ser stu, boriya xwarinê (oesophagus), dev an jî çena we bê kirin.

## Çi kare pêşiya azardîtinê bigire?

Ji bo kêmkirina metirsiya azardîtina diranên we, çend tiştên ku berî niştergeriyê hûn bixwe karin bikin hene.

Heke diranên we sist bûbin an jî pidîyên we diêşin an dema hûn dişon xwîn ji wan tên, hewce dike ku hûn bêrî niştergeriyê biçin cem diransazê xwe.

ji penckar re bêjin eger:

- heke diranên we sist bûbin an jî pirsgirêkên wekî din bi diranên we yan bi pidiyên we hebe
- heke di devê we de destekek an jî lastîken diranan hebin
- heke împlant, kron, pira diranan, diranên we yên kiraskirî yan jî diranên we yên çêkirî hebin
- li ziman û lêvên we pîrcîng hebe.

Heke berê benckirina giştî li we hatibe kirin, pêwîste ku hûn ji penckar re bibêjin û haya wan ji van jî çêbikin:

- heke ji we re gotibin ku bicîkirina lûleyê li rêhewaya we dijwar bû
- heke zerar li diranên we hatibin.

Carinan penckar ji bo sedemên dijwariyê fêm bike û ber dubare qewimîna wan azaran bigire, dibe ku li qeydên we yên bijîşkî yên berê binêre.

## **Heke ku diranên min azaran bibînin?**

Heke dema niştergeriyê de diranên we azaran bibînin, wê penckar we agahdar bike. Heke hin diranên we bikevin, ew ê wan li we vegerînin. Heke hewcedariya we pê hebe, ew ê dermanên sivikkirina eşê bidin we û şîretan bikin bê divê hûn çi bikin.

Li hin nexweşxaneyan de niştergerên diranan hene û ew karin li zerara hatiye diranên we binerin û we çêbikin. Heke ev yek ne berdest be, hûn dikarin biçin diransaz û lêçûna wê ji nexweşxaneyê bixwazin. Divê hûn li rêbazên di derheqê dema niştergeriyê azardîtina diranan de binêrin û formeke bixwazin da ku heqê lêçûnê li we vegerînin.

Heke penckar dema lûleyê di gewriya we de bicî dikir astangiyek dîtibe yan jî zerarek li diranên we hatibe, di derheqê van bûyeran de qeydek nivîskî bixwazin. Heke pêşerojê de we hewcedarî bi benckireke din çêbû, ev agahî dibe ku jiyana we biparêzin.

Koma bi navê Komeleya Rêhewaya Asê (The Difficult Airway Society), projeyek bi navê Qerta Hişyarî ya Rêhewayê (Airway Alert Card) dimeşînin. Penckar dikare we beralî wê projeyê bikin. Hûn dikarin agahiyên zêdetir li ser vê lînkê bibînin: https://das.uk.com/dar.

## Destûr nedan

Em gelek hewl didin ku agahiyên di vê belavokê de rast û nûjen bimînin, lê em nikarin vê yekê dabîn bikin. Em ne li bendê ne ku ev agahiyên giştî, cewaba hemî pirsên we yan jî çareseriya hemû tiştên ku ji we re girîng in bidin. Divê hûn vê belavokê wekî rêber bikar bînin û bijareyên xwe û her xemên xwe bi tîma xwe ya bijîjkî re bipeyivin. Divê ev belavok bi serê xwe wekî şîret neyê hesibandin. Ev belavok ji bo armancek bazirganî yan karsaziyê nayê bikar anîn. Ji bo destjêkişandin a bi temamî li vir binêrin: [www.rcoa.ac.uk/patient-information/translations/kurmanji].

Werger bi giştî ji aliyê civata wergeran a Translators without Borders (Wergerên Bêsînor) hatiye wergerandin. Kalîteyên van wergeran tên kontrol kirin da ku bi qasî ku dibe rast bin, lê metirsiya çewt wergerandin û çewt şîrovekirina hin agahiyan dibe ku çebibe.

# Ji me re bêjin ka bê hûn çi difikirin

Em pêşwaziya pêşniyarên ji bo baştirkirina vê belavokê dikin.

Ger têbînîyên we hene ku hûn dixwazin pêşkêş bikin, ji kerema xwe bi riya e-mail bişînin li ser: patiinformation@rcoa.ac.uk

**Royal College of Anaesthetists**
Churchill House, 35 Red Lion Square, London WC1R 4SG

## www.rcoa.ac.uk

Çapa Şeşemîn, Mijdara 2024
Ev belavok wê di nav sê salên piştî roja weşanê de were nirxandin.

**© 2024 Royal College of Anaesthesists**
Dibe ku ev belavok ji bo çêkirina bûjena agahiya nexweşan were kopîkirin. Ji kerema we, çavkanîya orîjînal binivîsin. Heke hûn dixwazin beşek ji vê belavokê di weşaneke din de bikar bînin, divê destûreke guncaw were dayîn û logo, marka û wêne werin rakirin. Ji bo agahîyên zêdetir, ji kerema we bi me re têkilîyê danin.